Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Îlon 2009

Efret Mihemed

Felek Naz Xelîl

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Naverok:

- **Malbata siyasetvanekî kurd ji mala xwe hate avêtin**
- **Leşkerekî kurd hate kuştin**
- **Xwendekarekî kurd hate binçavkirin**
- **Girtiyekî kurd di zindanê de jiyana xwe ji dest da**
- **Sê welatiyên kurd hatin binçavkirin**
- **Welatiyê kurd Xalid Gênco ji zindana Qamişlo bo Şamê hate guhastin**
- **Rê ne dan parêzerkî kurd ku ji sûriyê derkeve**
- **Dadgeha ewlekariya komarê biryarine giran dane çend çalakvanên kurd**
- **Çalakvanên kurd bo dadgeha leşkerî hatin guhastin**

Malbata ramyarvanekî kurd ji mala xwe hate avêtin
Roja 31.08.2009an hate ragihandin ku kargêriya zeviyên Rimêlan bi alîkariya hêzên asayîşan ên bajarê Rilmêlan, malbata ramyarvanê kurd ê binçavkirî Mihemed Seîd Umer ji malê bi zorê derxistin. Sedema avêtina wan ji malê ew e, ku bavê wan (M.S.Umer) demek dirêj ne çûye karê xwe, tevî ku kargêriya zeviyên Rimêlan agahdar e, ku birêz M.S.Umer binçavkirî ye!

Birêz Mihemed Seîd Umer endamê serkirdayetiya partiya azadî ya kurd li sûriyê ye û ji roja 26.10.2008an ve binçavkirî ye. Ew li kargêriya zeviyên Rimêlan kar dike.

Leşkerekî kurd hate kuştin
Roja 01.09.2009an malbata leşkerê kurd Ehmed Arif Umer (1988, gundê Mamala, Raco)

termê kurê xwe wergirt. Leşkerê kurd Ehmed Umer di Lîwayê 116an de erkê parastina welat pêk tanî. Berpirsiyarên wî li leşkeriyê malbata wî agahdar kir ku kurê wan bi elektrîkê (Kehrebeyê) jiyana xwe ji dest daye. Lê piştî ku malbata cendekê wî wergirt, hate xuyakirin ku şûna lêdan û azarîkirinê li ser laşê wî heye, herwiha birînek kûr di serê wî de heye ku bi paçekî hati bû veşartin daku neyê dîtin!

Tê zanîn ku ji serhildana 12ê avdara 2004an ve ev leşkerê 28an ku di dema erkê parastina welat de li leşkeriya sûriyê tê kuştin!

Xwendekarekî kurd hate binçavkirin
Roja 10.08.2009an hate ragihandin ku xwendekarê kurd Şivan Ebdiletîf Ebdo li ser sînorê sûriyê û îraqê hate binçavkirin û heya aniha çarenivîsa wî ne diyar e.

Tê zanîn ku xwendekarê kurd Şivan Ebdo di zanîngeha Şamê de beşê wêjeyê dixwend, lê di serhildana 12ê avdara 2004an de ji aliyê hêzên ewlekariya sûriyê ve hati bû binçavkirin û paşê ji zanîngehê hati bû avêtin, ji ber ku Internet bi kar tanî!

Ji ber van sedeman çû başûrê kurdistanê daku xwendina xwe berdewam bike, lê dema xwest serdana malbata xwe li sûriyê bike yekser li ser sînorê sûriyê û îraqê hate binçavkirn.

Girtiyekî kurd di zindanê de jiyana xwe ji dest da
Desthilatdariya sûriyê malbata girtiyê kurd Xoşnav Silêman agahdar kir ku kurê wan di zindanê de jiyana xwe ji dest daye û belgeyek bi mêjûya 31.03.2009 da malbata wî ku sedemên mirina wî tê de ne hatine nivîsandin.
Birêz Xoşnav Silêman di Êlûna 1998an ji aliyê hêzên ewlekariya komarê ve hati bû binçavkirin. Wî li Moskoyê beşê dermanasiyê dixwend û dihate serdana malbata xwe, lê bi tewana endamtiya PKK hate binçavkirin.

Sê welatiyên kurd hatin binçavkirin
Roja 11.09.2009an hate ragihandin ku welatiyê kurd Mehmûd Zibêr Mehmûd ji bajarê Qamişlo ji aliyê hêzên ewlekariya tewankariyan ve hate binçavkirin, ji ber ku belavokên partiya demoqrata kurd li sûriyê El Partî pê re hati bûn dîtin.

Herwiha heman hêzê êrîş biri ser mala bavê wî Zibêr Hesen Mehmûd li taxa Hilêlîkê û dest avêtin ser CDyekî ji çalakiyên komên govendê yên gelêrî û ew jî binçav kirin. Herwiha di heman rojê de birêz Ebdil Wehab Şêxmûs El Faris jî hate binçavkirin. Heya aniha çarenivîsa wan ne diyar e.

Welatiyê kurd Xalid Gênco ji zindana Qamişlo bo Şamê hate guhastin
Hate ragihandin ku welatiyê kurd Xalid Gênco ji zindana bajarê Qamişlo bo bajarê Şamê hate guhastin û heya aniha çarenivîsa wî ne diyar e. Tenê ji malbata wî re hate ragihadin ku kurê wan aniha li Şamê ye.

Tê zanîn ku Xalid Gênco di roja 01.09.2009an de ji aliyê desthilatdariya Elmanyayê ve bo sûriyê hate birêvekirin. Tê zanîn ku desthilatdariya Sûriyê û ya Elmanyayê di sala 2008an hevpeymanek naviş kirin, tê de hatiye gotin ku dê dora 7000 penaberên sûriyê (Piraniya wan kurd in) ji elmanyayê bo sûriyê bêne vegerandin.

Rê ne dan parêzerkî kurd ku ji sûriyê derkeve
Hate ragihandin ku hêzên ewlekariyê li Qamişloyê li ber sînor di navbera Qamişlo û Nisêbînê de rê ne dan endamê kombenda parêzerên hesiçayê Ebdil Selam Şakir Ehmed (1961) ku biçe Tirkiyê.
Herwiha jê xwestin ku biçe şaxê ewlekariya Şamê (Şaxê Felestîn) bo vepirsînê!

Dadgeha ewlekariya komarê biryarine giran dane çend çalakvanên kurd
Roja 27.09.2009an de dadgeha hindek welatiyên kurd pêk hat. Ew jî ev in:
- Şukrî Xalid Umer kurê Ebdo 1988 roja 19.02.2006an hate binçavkirin.
- Sefqan Reşîd Xelo 1990 roja 19.02.2006an hate binçavkirin.
- Reşîd Reşîd Xelo 1958 roja 19.02.2006an hate binçavkirin.
- Ceger Mihemed Ikram Şêxo 1989.
- Ferhad Mihemed Mihemed.

Dadgeha wan heya 20.10.2009an hate taloqkirin. Herwiha dadgeha hindek welatiyên din pêk hat. Ew jî ev in:
- Kamîran Xelîl Mihemed.
- Inayet Ebdil Ezîz Xana.

Biryar hate standin ku 8 salan di zindanê de bin û karên giran pêk bînin. Tewana wan jî endamtiya partiyek biratiya kurd û ereban e (Tevî ku li sûriyê tu partî bi vî navî tunene) ku armanca wê dabeşkirina sûriyê ye. Herwihan birêz Elî Mistefa Reşîd Zilfo bi 6 sal zindan bi heman tewanê hate sezakirin.

Çalakvanên kurd bo dadgeha leşkerî hatin guhastin
Feleknaz Xelîl Xelîl, Efra Mûsa Mihemed û Mihemed Xelîl Xelîl ji aliyê nûneriya giştî ya leşkerî li Helebê bo dadgerê leşkerî li Helebê hatin guhastin. Tewana wan jî endamtiya rêxistineke nihênî û qedexe ye li gorî bûjena 288an di yasayên sezayan li sûriyê. Tê zanîn ku ew di roja 02.08.2009an de li taxa Zorava li Şamê hati bûn binçavkirin.
Herwiha çalakvana kurd Rojîn Cuma Remo bo dadgerê leşkerî li helebê hate guhastin. Rojîn Remo di 29.07.2009an de ji aliyê hêzên ewlekariya sûriyê ve hati bû binçavkirin.